



**Dr Nûredîn Zaza**  
1919- 1988



**Osman Sebrî**  
1905 - 1993

*Ji  
weşanên  
Partiya  
Yekîtiya  
Demokrat  
a Kurd li  
Sûriyê -  
YEKÎTÎ*

Xebat ji bo :

- \* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
- \* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
- \* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

## **Turkiye... Gavek Li Pêş**

**H**ukûmeta Anqerê bi rêvebiriya parta AKP û serokwezîr birêz Recep Teyib Erdoxan, di derbary pirsê Kurd de, gavek li pêş davêje, dema ku, li vê dawiyê, bi awakî vekirî, rasterast û aşkere kir ku: ( dewleta Turkiyê di derheqê Kurdan de, gelek şaşî kirine... )

Di dîroka Turkiyê de, eve cara yekemîne ku, daxuyaneke weha ji dev û lêvên serokwezîrekî li ser serê kar, ji raya giştî re tê gotin, Lewre jî, hemî deriyên daxuyan, nivîsar, manşêst û helwestên rengareng û tersîhev vebûn, û têra xwe hêz û bartiyên siyasî, rewşenbîr û rêxistinên Kurdan bi vê yekê mijûl bûn û hê jî berdewamin û yê pir ma ye.

Jêderên Anqerê dibêjin ku, eve destpêka çareserkirina pirsê Kurda ye û parta Erdoxan wedê giravî- di vî warî de, xwedî piroje û biryar e.

Di vî warî de, wezîrê hundirî, birêz Beşîr Atalay û yê derve birêz Ehmed Dawûd Oxlo jî, di derheqê pirsê Kurdî de, daxuyaniyên erênî dan. Vêca Kurd weke dixuyê, li hêlekê dixwazin şa bibin û hêviyên nû ava bikin. Li hêla dine, bi tirs û kêmbawerin ku, hukûmet li gor peyv û sozên xwe be, û bêje: (( Duh duh bû, îro îro ye)). S. Demirel.

Çi bibe û çi nebe, civata perlemana Turkiyê ya ku, di rojên bê de lidarkeve, dê bibe xuyakirin ku, berê siyaseta dewletê bi ku ve ye, û AKP ta çi derecê li helwestên xwe yên erênî di derbarey Kurdan de, dibe xwedî, û serê xwe li ber bayê şovenîzîm û nijadperestiya hin hêz û partiyên Turkan netewîne. Wê hingê tabloya siyasat û helwestan, dê zelaltir bibe.

**D. R ( 2 )**

### **Pirsa Kurd ...**

**Azad Kurdî**

**4**

### **Kesatiyeke Balkêş**

**Enehîte Morad**

**5**

### **Pirtûkxana Kongirês**

**Wergerandin :  
Memê Alan**

**6**

### **Her diçe....**

**Rêberê Silivî**

**12**